Pirosesa Cîhanîbûnê Û Têkiliya Navbera Çandên Netewan

Hoşeng Kerem Tacir

Pêşveçûnên ku di hemû warên jiyanê de, nemaze ji aliyê civakî û çandî de derketine holê, gelek sînorên ku ji aliyê hêzên desthilatdar li ser civakê de hatine pêk anîn, bê bandor dike. Yanî mirov dikare bibêje ev yek sînora radike û di encama wê yekê de jî têkiliyên çandî û civakî bi awayekî otomatîk di navbera gelan de pêş dikevin.

Bêguman pêşveçûnên ku îro di asta teknîk û teknolojiyê de derketine holê û her wisan destkevtên wê, gelek ji şoreşên ku heta niha hatine pêk anîn, zêdetir e. Yanî em behsa şoreşan dikin, divêt ev yeke were zanîn ku di naveroka her şoreşekê de, yanî di heman cevher û kakila wê de guhertin heye, yanî şoreşên heta niha di dîroka mirovan de hatine çê kirin, ji bo hilweşandina nîzamên kevin û anîna nîzameke nû ye, yanî ew dixwaze bi rêbazên cuda cuda sîstem û hizrek nû bi xwe re bîne, lê belê em baş dibînin ku îro teknolojiyê bi xwe şoreşek mezin di navbera mirovan de pêk aniye.

Yanî em li vira bidestxistiyên şoreşên mirovî heta niha hindik nabînin û li hember wan bêrêziyê jî nakin. Lê em li ser vê yekê bisekinin ka em çawa bikarin di dunyaya niha a pêşkevtî da ji mîrasên şoreşan xwedî derbikevin. Bêguman eva gelek girîng e û di pirosesa nû ya cîhanî de hewce ye gelek nîqaş û analîzên zanistî em li ser wê çê bikin.

Em baş dibînin ku şoreşa teknîk, înternet û wd... gelek xizmetê ji me re dike û bandora wê li ser jiyana me her roj zêdetir dibe û bi xwe re guhertinên mezin çê kirine. Ew guhertin tenê ji aliyê teknîkê de nemaye, belkî bandora wê li ser hizr û jiyan û çanda me gelek diyar e. Niha di vê rewşê de hewceye em çi bikin? Gelo em wek Îslamiyên radîkal û paşverû li hember wan de bisekinin û wekî Îranê û zaf dewletên din qedexeyan bidin ser însanan? Ku encama wan qedexeyan îro ji me hemûyan re aşkira ye. Hewce ye em vê yekê bibînin ku guhertin îro li roja me da wek pêlên avê xwe gehandiye hemû deverên jiyanê û li bingeh da her mirovek wê yekê dibîne û ji destkevtên û berhemên wê mifahê distîne.

Xala sereke û ya girîng di vê pirosesê da eva ye ku teknîk û ew guhertin bi xwe re çandekî taze tîne û bandorê li ser civak û her mirovekê datîne. Her çend ku îro gelek kes di pirosesa cîhanîbûnê de pirsa neteweyî zêde berçav nagirin, lê divêt em baş bizanin ku her neteweyek bi hebûn û rengê xwe, bi ziman û çanda xwe di wê pirosesê de hebûna xwe diyar bike û ji pêşveçûnan, bo pêşvebirina çanda xwe bikar bîne, ne ku di nava wan pêşveçûnan de were helandin.

Îro û di vê rewşa han de pêwîst e ku em wek gelê Kurd di nava wê pirosesê de ku her roj rengek cuda bi xwe digire û pêş diçe cihê xwe bigirin û ji netewe û çandên din yên cîhanê ku nîva çanda me dewlemend ninin, paş nemînin. Çawa dibe ku kaniya çand û gelek kulturan paş bimîne! Kê berpirs yarê/a wê yekê ye? Ji bo piraktîzekirina wê yekê hewce ye ku di destpêkê de zana û ronakbîrên Kurd bi bê ji berçavgirtina wê yekê bilivin û li ser rastiyan îsrarê bikin û li hember bizava paşmayî ya ku wekî pence şêrê civaka me dixwe û bi hemû hêz û şiyana xwe şer bikin û nebin beşek ji wan.

Her wekî me li jor diyar kir, gava sereke û bingehîn ku kilîta gelek pirsan vedike, şerkirin li hember hizra kilasîk û paşmayî di nava civakê de ye û eva wezîfe û erka her ronakbîrekê ye ku wî navî li ser xwe datîne.

Beşek ji tioriyên nasiyonalîzm û netewe

Şakir Molayî

Diyarîkirin û pabend bûn tenê bi yek pênase bo peyva nasiyonalîzmê nikare ev cura ku hewce ye nasiyonalîzmê bîne ber çav. peyva nasiyonalîzmê xwe pênaseyeke aloz e. Ev pênasên ku bo nasiyonalîzmê hatine, li çav pênasên ku bo sîstemên fikrî yên dinê wek (Lîbralîsm, Faşîsm, Komonîzm, ...) hatine, gelek kêm in, çimku her yek ji wan mijarên fikrî û siyasî fîlsufê taybet bi xwe hene. Lê belê nasiyonalîzm bê fîlsuf bûye û tenê li destpêka sed sala bîstan de wek pênaseyekî siyasî û çandî û civakî bala hinek ji nivîskaran bo aliyê xwe kişandiye.

Nasiyonalîzma her neteweyekê li jêr hinek pênasên coda ji netewên dinê tê holê, lewra ji dîtingeha Şîfêr ve: Nasiyonalîzma her neteweyekê dibe semboleke fikrî bo pênasekirina her netewekê, bi awayekê ku tevî netewên dinê ferq û cudahî heye. Bo mînak nasiyonalîzma Ewropî tu car bi tewayî naşibhe bi nasiyonalîzma Asiyayî yan Amerîkayî, wek çavan nasiyonalîzma Almanî bi tewahî naşibhe bi nasiyonalîzma Firensî, û nasiyonalîzma Kurdî jî bi tewahî naşibhe bi nasiyonalîzma Farsî û Erebî û Turkî û gelên dinê.

Wate û pênasa nasiyonalîzmê li serdemekê bo serdemeke dinê û li cihekê coxrafî bo ciheke dinê û li qonaxekê bo qonaxeke din cuda ye û heta peyva nasiyonalîzmê jî li zimanên cuda û serdem û qonaxên cuda de, û li nav nivîskar û xudan bîrên nasiyonalîzmê de bi wateyên cuda hatiye pênase kirin.

Peyva nasiyonalîzmê hatiye wergerandin ji peyva (nationalizm) Înglîzî yan (nationalite) Firensî ku li peyva (nation) netewe hatiye wergirtin.

Satiî El Hesra dibêje: Bi sedema bûna nasiyonalîsmê mirov hez li netewa xwe diket.

Nasiyonalîzm hez kirine bo netewe yan pêwendiyeke siroştiye ku mirov bi xortên netewa xwe ve girê didet.

Hinek ji nivîskar û xwedî hizran nasiyonalîzmê bi berhema vehm û xeyal û hinek jî bi nexweşî û hinek jî bi kofr dihesibînin.

(Dr. Ehmed Cemal Zahir) dibêje: Her çend ku peyva nasiyonalîzmê bi aloziyeke mezin re têkel bûye, lê belê wateya wê peyvê ji vê yekê zêdetir nine ku hesteke tevlîbûn bi nîştiman, bo nasandina nasnameya xwe ye.

Di çanda harêman de jî hatiye: Nasiyonalîzm tevlîbûna mirov tevî dewletê ye.

Ehmed Cemal dîsan jî dibêje: Nasiyonalîzm hertim hesteke mezinxwazî û xwe bi mezinzanîn li çav netewên dinê ye, ku eva jî bi armanca parastina nasnameya neteweyî ye.

Nasiyonalîzm weke her bîr û hizrekî din ya siyasî dema ku ji isûl û pirensîpa xwe der ket, dibîte diraveke du rû, ku li her do aliyan de jî dixebite. Aliyek karkirine bo parastina netewe, nasname û ziman û keltura netewî, dîrok û ax, paşan jî damezirandina dewleteke neteweyî, aliyê dinê ku derketin ji isûl û pirensîpên fikrî û siyasî yê nasiyonalîzmê ye, tê wateya îrêş û zêdexwazî bi ser maf û keltûr û serweriya netewên dinê, ku Ehmed Cemal rûyê xirab yê nasiyonalîzmê dîtiye, ne rastiya siyasî, civakî û dîrokî ya nasiyonalîzmê.

Damezrînerê (Exwan Elmoslimîn) Hesen Elbena di

sala 1936'an de gotiye: Her Wek çawan berf li hember tîrêja rojê de dihele, nasiyonalîzm jî li hember yekîtî û biratiya bisilmana de ji nav diçe.

peyva nasiyonalîzmê licem Gilînêr weke bizaveke siyasî qinaeteke siyasî û civakiya naskirî ye, ku bawerî bi çend pirensîpên taybet heye, wek yekîtiya netewe û deshilata siyasî bi mercekê ku ew deshilat bi navê xwe be ne yê biyanî.

Li gor vê nasandinê armanca yekemîn a nasiyonalîzmê navbiriye ji avakirina qewareyeke siyasî bo kelturekê yan panatiyeke erdnigarî-neteweyî a kifş û hevgirtî.

"Îrîk Habisbavm" li ser vê baweriyê ye ku eva netewe nine ku nasiyonalîzm û dewletê çê dike, belkî eva nasiyonalîzm e ku dewlet û netewê çêdike.

"Hanz Kohên" dibêje: Nasiyonalîzm haleteke eqlî û hesteke hewce ya xelkê civatgehê ye ku nîşandana piştgîrî û hezkirinê ye bo dewleta neteweyî.

Bi hizra min: Nasiyonalîzm sîstimeke fikrî yan bîr û hizreke siyasî û civakî ye, ku endamên civakê bo hezkirin û parastin û ber bi pêşde birina bingeha eslî ya netewe û ragirtina berjewendiyên bilind yên netewe xebatê dikin, nasiyonalîstên bê dewlet bo avakirina dewleta serbixwe û nasiyonalîstên xudan dewlet jî bo pêşve birina abûrî û parastina serbixweyî ya siyasî xebatê dikin.

KURDÎ BÛ ZIMANÊ KOMPUTERÊ

Êdî dema mirov têkeve înternetê dê Firefox bi Kurdî be. Êdî dema mirov gotara xwe binivîse dê OpenOffice bi Kurdî be, wekî Word, Exel û hwd.. . Êdî dema mirov nivîsa xwe dinivîse dê komputer kontrola rastnivîsa kurmanciya latînî bike. Cara yekem bi awayekî fermî Pergaleke Xebatê ku li şûna Windowsê bête sazkirin, bi kurmanciya latînî hate weşan. Navê pergalê Linux Ubuntu ye.

Hate ragihandin ku Linux Ubuntu di 6ê meha 6an de bi awayekî fermî digel gelek zimanên din bi Kurdî jî tê weşan. Li gor vê yekê, êdî dê her kesê xwedî komputer bikaribe Linux Ubuntu ya kurdî li komputera xwe bar bike û her cure xebata xwe ya li ser komputerê bi kurdî bike.

Di wergera Linux Ubuntu de Erdal Ronahî, Jiyan Alpîran, Rêzan Tovjîn, Amed. Ç. Jiya, Rizoyê Xerzî û gelek kesên din cih girtine. Di Ubuntuyê de dema mirov bi kurdî dinivîse kontrola rastnivîsa Kurdî jî bixweber tê kirin û dema gotinên çewt tên bikaranîn, binê gotinê bi xêzeke sor tê xêzkirin. Her wisa OpenOffice û Firefox jî bi kurdî li ser Linux Ubuntu hatine bicihkirin. Endamê rêveberiya komeleya komputergerên kurd Rêzan Tovjîn der barê Ubuntuyê de hinek agahî dan û got "Çiqas kes bi kar bînin dê çewtiyên me jî ewqasî zû bên serastkirin. Ez hêvî dikim ku bi hezaran kurd CD'yên Linux Ubuntu bixwazin. Jixwe belaş e."

Tovjîn ji bo sazkirina Linux Ubuntu jî dibêje "Mirov ne mecbûr e ku li ser komputera xwe saz bike. Gelek riyên din jî hene. Mînak CD ya Zindî ye. Tu dikarî wê CDyê têxî komputera xwe û Ubuntu ya Kurdî bi kar bînî. Dema karê te qediya jî derxe. Heke baş kete serê te, tu dikarî CD ya sazkirinê têxî komputera xwe û Ubuntu bi tevahî li şûna Windowsê saz bikî. Heta mirov dikare di komputera xwe de Windowsê raneke û Ubuntu jî digel wê saz bike."

Maku Bajarê Madan, Yadigara Kurdan

Mecîd Cînkanlo



Şehristana Makuyê ku rûberê wê nêzî 7030/7 kîlometira çar guşe ye, ketiye bakura Kurdistana Îranê û sînorê navbera Turkiyê û sovyeta berê de.

Ev şehristana ji aliyê bakur ve digihîje rubarê Qere Su û Kurdistana Turkiyê, û ji aliyê rojhilat ve digihîje rûberê Eres û welatên Ermenistan û Azerbaycanê. Bajarê Makuyê bi ruberê 3/8 kîlometra çarguşe ketiye navenda vê şehristanê de. Ev bajarê Kurdistana Îranê di warê dîrokî de pir kevnar e, û meriv dikare bibêje ku eva yekemîn nuqte ji Felata Îranê ye ku Aryayî hatine wir û li wir de akincî bûn. Yek ji eqwamên Arî ku li gorî gişt senedên dîrokî, hatne bajarê Makuyê û serwetir ji wir, û li wir akincî bûn, **Mad** bûn, ku navê mezinê xwe (Maday) danîne ser vî ser erdî, ku navê bajarê Makuyê ji vî navî yanî Madkuh'ê hatiye wergirtin. **Mad** li nêzîkî hezareya sêyemîn berî zayîna Mesîh hatine Îranê û bi pêkanîna dewleta xwedî hêz a Mad, davî qonaxa desthilatdariya tayifeyî pişt serê xwe ve hêlan û yekemîn pêngav bo pêkanîna dewleta xwe a xwedî hêz di serdemê xwe de hilgirtin. Lê tişta ku îro rojê piraniya lêkolînvanan tûşî heyrîmanê kiriye hebûna hinek qebîleyan ji Madên aryayî bi navê Urartu bûn ku berî Mad'a jî li wir bûn. Urartu an jî Ararat ji tuxmê Madan bûn ku nêzî sadsala 7_8'an berî zayînê, di rojhilatê Anatoliyê û li derdora behra wanê de jiyan kirine û li ketîbeyên bi cî mayî ji wan, bi navê dewleta Urartu an jî Ararat hatiye binav kirin, ku li dîroka Hîrodut de bi welatê Alarud hatiye naskirin. Piştî zal bûna dewleta xwedî hêz a Mad bi ser dewleta Urartu de, ser erdê Urartu(Ermenistana niha) kete ser xalya Mad, û bi kiryar Ermenistan kete ser parêzgehên dewleta Mad. Piştî vê demê ku Ermenî ji Asyaya Sexîr hatne derêxistin, ew hatne ser erdê Urartu(Ermenistana niha), ku tevlî Urartuyan bûn û ji wê demê pêde, ser erdê Urartu bi navê Ermenistanê hate navbirin. Tuxmê Urartuyiyan pitir nêzî **Huryan** e. Lewra miriv bi curet dikare bibêje ku bajarê makuyê ser erdê eslî ê Kurda ye û dîroka Kurdistanê di vê nuqteyê de dest pê kiriye, û her wekî em gişt dizanin di destpêkê de dînê Aryayiyan Zerdeşt bûye, çimku li gorî gişt medrekên dîrokî, Zerdeşt risaleta xwe ji başura rojava a Îranê ve dest pê kiriye, û pêka zaf ji senedên dîrokî wekî, sefernameya Yaqut Hemewî, Xurdad, Biladzî û çendîn nivîskarên rojhilatî, Urmiyê wekî sererdê dayîkiniyê ê zertoşt hatiye naskirin, û heta bûna gora dayîka Zertoşt di gundê Enbê, di herêma Tergevera Urmiyê, nîşaneya vê rastiyê ye. Lewra em dikarin bêjin zertoşt pêxemberê Îrana bastan, ku dînê xwe ji bakûra rojawa Îranê, (Urmiyê) dest pê kir, ji Madan bûye. Îca niha miriv dikare bi hêsanî li ser dîroka Azerbaycan (Atrupatkan)ê û bi taybetî bajarê Makuyê bîr û raya xwe eyan biket. Bajarê Makuyê di dest pêka sedsala 8'an berî zayînê de, li jêr deshelatdariya tayîfeyên Mad Şubar û nayriyan de bûye û di sala 800_825'an berî zayînê, paşayê Araratê Menş Çetriya hemen Menûçihrê şahnameya Ferdusî îrêş biriye bo aliyê başûr, da ku bikare pêşiya îrêşa Atur Nazpal û Selem Nesr(Tur û selm a Şahnamê) paşayên Aşûr bigre. Wan li başûra rojava a Behra Urmiyê ketîbeyeke pir buhagiran ji xwe bi cî hêştiye. Îbrî dibêjne vê dewletê Ararat, Aşur dibêjnê Urartu û dîrokzanê naskirî ê Yunanî,

Hêrdut dibêjê Alarud. Hêrodut dibêje, di derdora çiyayê Ararat qewmê Alarud, Halidî diperestin, ku bi bêy şik û guman seba vê yekê digotne vê tayfeya Kurd, Xalidî yan jî Haldî. Mayir dibêje nîştimana vê tayfê Arasa Navîn e, ku ev der ciyê tayfeyekê ji Mada bi navê Arzant bûye. Herweha li gorî medrekên heyî, hebûna herêmekê bi navê (Xalidiya) di nêzîkî Tirabuzan di serdemê Împiratoriya Roma Rojhelatê îsbat diket ku sînorê hikûmeta Ararat heya behra reş bûye. Pêkhatina dewleta mezin a Mad di serdemê paşatiya Howexişter de, qewmê Halidî neçar kir ku peyrewiyê ji wê dewletê biket, û bingeha hikûmeta neteweyî a Ararat zeîf kir, herçend ku vî paşayî karî sînorê dewleta Mad, bigehîne rubarê Qizil Îrmaq(Rubarê Halîs)ê, û dewletên derdora Mad êxiste lerzê, lê kurê wî Îxtukiyu(kêykawus) wekî bavê xwe cesûr û zîrek nebû, û gelekî zû zaf ji wan sererdan ji dest da. Carna paşayên Maku(Ararat)ê ji nava mezinên Manaiyan ku başura rojawa a Urmiyê de hikumet dikirin, dihatne hilbijartin û ev yeka jî goreyekê xwe, hevtuximbûna van du qewman îsbat diket. Di sala 600'an berî zayînê, çimku Ararat û Urartu îdî dewletekî serbixwe çinebûn, ketne ber îrêşa Ermeniyan. Hêrodut dibêje, serwetir bûna pileya şaristaniyeta Araratiyan, Ermenî neçar kirin ku dînê wan qebûl bikin û, ew herêma ku seba Halidî, digotnê(Mabibinan), kirine a xwe û xwe jî bi Halidî an jî Hayiq binav kirin, lê dîsan jî Ararat, hergav zadgeh û sererdê Halidiyan bûye û qet îzna nêzîkbûna Ermeniyan bo herêmê nedaye, û Ararat ew çiyayê hêjageh(Moqedes) hertim çepera xebata Kurdan li qonaxên curbicur ên dîrokê de bûye. Paşê îsbat bû ku navê tayifeyên curbicur ên Araratê, kurtî Mard, û Amîrd, li dîrokê û ketîbeyan de hatiye. Xalidî, kurtî Mard, û Amird her yek beşek ji tayifeyên Gotî bûne. Van tayifeyan ne tenê di axa Madkuh(Ararat)ê de jiyan kirine, belkî bi gewahyariya Istirabûn û dîrokzanên din, van di tewaya axa Azerbaycana Rojhelat û Rojava de li jêr van navan de jiyan kirine, ku paşan bi peydabûna dînê Îsewî, Araratî naçar kirine ku dînê wan qebûl bikin. Li sala 279'an a Zayînî de, Tertab Paşayê Ermenî dema ku dînê Îsewî qebûl kir, li derdora bajarê Muşê bi sedan kesî ji ruhaniyên Halidî kuştin û xelk neçar kir ku dînê Îsewî qebûl bikin. Piştî belav bûna dînê Îslamê zaf ji Araratiyan tevlî hevtuxmên xwe ên Kurd bûne û dînê Îslamê qebûl kirine, lê hinek ji Kurdan her li ser dînê mesîhî mane ku niha jî Kurdên Ermenistanê xwediyê dînê Mesîhiyetê ne. Heta niha li nava kurdan de hinek malbat têne dîtin ku hêla jî li deb û resmêt wan de hinek ji bîr û bawerên Mesîhî têne dîtin. Herweha di nava Ermeniyan de jî hinek kes hene ku bi zimanê Ermenî qise nakin, belkî bi Kurdî qise dikin ku mînaka herî berçav em dikarin di welatên Qezaqistan, Ermenistan û Tacîkistanê de bibînin, ev du girupane jî tuxmên Halidiyan bûne ku dînê Mesîh qebûl kirine. Girupa yekemîn paşan bûne misilman, lê girupa duyemîn her li ser bawera mesîhiyetê mane, lewra divêt em zortir li ser hesta neteweyî pêdagiriyê bikin, ne li ser meseb. Kurd ji her mesebekê din, rêz û hurmetê ji bîr û bawerên yektir digirin, rêz ji bîr û bawerên netewên dinê digirin û cudahiya meseb nikare li nav me de bibe sebebkarê perçeperçe bûna netewa me, çimku hertim hakimên zalim yên ku sererdê Kurda dagîr kirine, bi mifah wergirtina xirab ji cudahiya dîn, û bîr û baweriyan, xwastineî neteweya mezin a Kurd, berdne canê yektir, da ku bibne emrazek di destên wan de, lê mixabin di vî warî de carna serkevtin jî destve anîne. Dema ku dînê Îslamê di rojhelatê de zêdetir belav û hakim bû, hêdî-hêdî Kurdên Ararat(Maku)ê hatne ser kar, ji wan xandanên Şedadî naskirî bi tayîfa Rewadî bûn ku li derdora bajarê dîwîn paytexta pêşîn a Ermenistanê û çiyayê Ararat de akincî bûn. Ew di destpêkê de li Gencê û Qefqazê de bûne hakim û piştre bi ser tewaya Ermenistanê de hakim bûn. Bi vî awayî Ararat dîsan kete destê xortên xwe ên eslî de. Nêzî sedsala 5'an a Mişextî bû ku yekîtiya Kurd-Ermeniyan li hemberî îlên dagîrkar û talankar ên tirk sergirt. Îlên yaxî û talankar ên Tirk de destê wan ên talanê heya sînorê sererdên kurda jî dirêj bûbû. Paşayê xwedîhêz ê Kurd Menûçihr kurtkirina destê talanê ê wan bi hewce zanî, û teesobatên dînî danîne qeraxê û dest bo şemşîrê bir. Kirîhur kurê Wehak ku ji kesayetiyên xwedî nifûz û mezin ê Ermenistanê bû çû hevkariya hêzên Kurda û derbekî wisa li îlên yaxî ên Tirk da ku heta heyamekê herêm bi nebûna wan hêmîn bûbû. Piştre dema ku îmaratên Kurd li herîmên cur bi cure Kurdistanê ji aliyên xelîfeyên Osmanî ve ji nav çûn, Kurdan dîsan sererdê Araratê kirne ciyê xebata xwe dijberî hakimên Kurdistanê.

Di warê çawaniya hatina qewmên Turk bo Makuyê û serdemê hatina wan bo Azerbaycanê zanayê Îranî Seîd Nefîsî dinivîse: Di destpêka sedsala pêncan a Zayînî, Îran ji du aliyan ve bi du qewmên bi tewahî biyanî ve rûbirû bû. Yên ku ji aliyê sinorên bakûra Rojava ve hatine Îranê,

Îraniyan digotne wan Heftal, û Ereban digotne wan Hîtil, û yên ku ji aliyê sînorê Rojhilata Îranê ve hatine, Îraniyan digotne wan Xezer, ku her du jî qewmên turk bûn. Ji wê demê pêde tuxmê bîhanî ê Turk bi tewaya hewla xwe xwastine ku xwe bikne nava axa Îranê de.

Moxol ku li dawiya sedsala 6'ê Mişextî û 13'ê Zayînî yanî nêzî 900 sala piştî Turkan li dîrokê de peyda bûn, îsbat bû ku Turk in, çimku li warê ziman, çand û saluxan ve gelekî şibhê hev bûn û şibhê hev in. Ji vê demê pêde qewmê Turk hertim xwastine ku xaliya Atrupatkan yan Azerbaycana niha dagîr bikin. Lê qet nekarîne ku ev cura dixwazin bi vî awayî li wir de akincî bin, çimku akinciyên eslî yên Makuyê yanî Kurdan ew ku koçber bûn qebûl nedikirin.

Ev rewşa her bi vî awayî dirêjî kêşa heya hikumeta Turkên Sefewî li Îranê de demografiya Azerbaycanê heya qasekê guherî û kêm kêm Turk hatne welatê Kurdan. Cuda ji vana li van rojgarên ku heta Kurdên Makuyê Zertoştî bûn, çiyayê Agirî borkanekê nîve feal bû, Kurdên Makuyê bona rêz girtin ji agir, navê çiyayê Araratê kirne çiyayê Agirî, û niha piştî derbas bûna bi sedan salî, ev xelka bi nîşaneya dînê zerdeşt dibêjnê Agirî. Agirî li her çar parçên Kurdistanê de çiyayê herî bilind e, ku hertim wargehê xebata netewa Kurd bûye û li çaxê şoreşa Agirî de bi rêberiya Îhsan Nûrî paşa yanî şoreşa Xuybûn, Komara serbixwe a Araratê di vê ciyê de hate ava kirin, ku piştî şikesta xuybûn û Komara Ararat di sala 1920'an de Şahê Îranê li kiryarekî îxanetkarane de, bedela wergirtina çend hezar metir erd li herêma Sêroyê, çiyayê Agirî awête ser axa turkiyê.

Herweha şahê Îranê, di sala 1909'an de nêzî 300-350 îlên Kurd, ji herêmên Makuyê şandne Qezwînê, ku niha jî Kurd di parêzgeha Qezwînê de ne, û xulyaqeta wan zêdetir ji 800- 900 hezar kesî dibin.

Serbarê wana jî Şah Ebbas nêzî 8-10 hezar malbatên Kurd ên Maku û Xoyê li serdemê selteneta xwe tebîd kirine sînorên Xurasanê, ku niha nêzî 2 mîlyon Kurd li parêzgeha Xurasana bakûr hene ku piraniya wan xelkê herêmên Xoy, Maku, Urmiye û Selmasê ne, serbarê vana Şah Tehmasb jî gelek Kurd ên Makuyê şandne çiyayê Demawenda Tehranê. Lê bi vî halî hêla jî bajarê Makuyê sîmayê xwe ê Kurdî parastiye, herçend ku niha jî gelek ji Azeriyan di vê Şehristanê de dijîn, lê bajarê Makuya cîwarê Kurda, bajarekî Kurdisatnî ye û wekî gişt noqteyên Kurdistanê, bona Azadiyê zaf ji xortên xwe goriyê netewa Kurd kiriye. Herweha meşa van dawiyane a xelkê bajarê Makuyê ku têde 10 kes şehîd bûn, bi xwe senedek e bo Kurdistanîbûna vî bajarî.

Kurtiyek ji marşa neteweyî a Komara Ararat.
Agir dirijand ser seran
Agir dida her deran
Erd dihejand car caran
Hil be Agirî, hilbe Agirî
Newalê te tijî xwîn bûn
Xilxilên te tejî cendek bûn
Îro dîsan hêrsa te hat
Ew agirên te bûn kelat
Kom bûne êdî ser tê civat
Ji Kurdan re te kir xebat
Hilbe Agirî, hil be Agirî
Ji tirsa te Turk girî
Te dît çawa ew revîn
Rastî berê agir tu bûyî
Lê îro lawên te bûne agir
Hil be Agirî, hil be Agirî

Çavkanî:

1_ Dîroka Azerbaycana Rojawa, Bergê 1û 2 N: Îrec Efşar
2_ Dîroka Urmiyê: Ehmed Kawyanpûr
3_ Zertoşt pêxemberê Îranê:Elî Dehqan
4_ Hereketa Kurdan ber bi aliyê Xurasanê: Kelîmolah Tewehudî
5_ Bûyerên Araratê: Kawe Beyat

Hunermend Kazo:

“Hunermend Divêt Bîr Û Baweriya Gel Be”

Hevpeyvîn: Dara Natiq

Hunermend Kazo sala 1953’an li gundekî girêdayî bajarê Wanê, di malbateke bine huner de ku gelek jî dostê hunerê bûn û huner jî hez dikirin, hate dinê.

Bav û kalê Kazo jî tenbûrvan bûn, lê Kazo her di 10 saliya xwe de bi pişgiriya kalê xwe tevlî cîhana hunerê bû û di zarokatiya xwe de bi civakê re hate nas kirin.

Hunermend Kazo sala 1976’an, di nava malbata xwe de Komekî hunerî bi navê Koma Şêrwan ava kir, Kazo bi Koma Şêrwan re heya niha 25 kasetên cur bi cur derxistine.

Li seredana hunermend Kazo ya vê dawiyê bo Kurdistana Başûr me bi hewce zanî ku derheq rewşa gelê me yê Bakûrê Kurdistanê di warê çandî de û armanca hatina wî bo Kurdistana Başûr û rewşa stiran û muzîka Kurdî bi giştî û … wî hunermendê hêja û dengxweş bi vî awayî bînin axavtinê:

Hunermend Kazo em ji aliyê rojnameya Agirî ve bixêr hatina te bo nava şoreşvanên PDK Îranê, mekteba Qazî, Qasimlo û Şerefkendî dikin.

Kazo: Ez jî gelek dilşad im ku îro xwe di nava şoreşvanên PDK Îranê de dibînim, bîranîna Qazî, Qasimlo û Şerefkendî bo min gelek pîroz e, ez hertim wan di helbestên xwe de dibêjim. Hêviya min yek jî ev bû ku ez di nava wan de cih bigirim, ev jî hate cî û ezê bi dilê rihet di goristanê de bimirim.

Mamosta em hez dikin di destpêkê de bizanin armanca te ji hatin bo Kurdistana azad çi bû?

Kazo: Rast e du sebebên sereke hene: Yek ji wan eva cara duyemîn e ku ez tême Başûra Kurdistanê, mixabin min hindekî dilêşî dîtin, ez çûm Helebçê jî,

min konser dan, gelek hunermendên me jî Helebçe sitirîne, mixabin neçûne Helebçê û nesekinîne, derdê zor û zêcê Helebçê nepirsîne û ser goristana wan nesekinîne, her ji dûr ve Helebçe gotine, ez di vê demê ve heya niha bûme pêrekan ketime navbera Bakûr, Başûr, Rojhilat û Rojava. Ez li Kurdistana Rojhilat ve hatme deriyê Hacî Omeran, bes min tu ferq û cudabûn nexiste navbera partiyan, partî çi bibe bila bibe, hemû partiyên me ne, diviya partî cuda bifikirin, lê hunermend diviya yek bin, bîr û baweriya gel bin. Daxwaziya min ya herî mezin ewa ye ku ez girêdayî gel bim û gelan bigehînme hev. Di wê demê de xemgîn bûm, lê baweriyek min hebû ku gelê me bi taybetî bibe yek û bîr û baweriya xwe pêşve bibe, sebeb vê carê jî eva ye ku Kurdistanekî azad û federal hatiye ava kirin. Mebesta min ya herî mezin vê carê, min got ez biçim ku eceba rewş û remza Kurdistanê çî ye û di Kurdistama me da çi guhartin çê bûne. Dîtina gel, danûstandina gel û gel bo me girîng e. Gel zaf Kazoyan diafirîne, lê Kazo nikare gel biafirîne, ji ber vê ez dibêjim diviya partî rengê xwe biguherîne, dengê xwe biguherîne, ema Kazo rengê xwe û dengê xwe naguherîne, ji ber ku Kazo reng û dengê gel e.

Li gor dîtina te Kurdistana Başûr di vê heyema derbasbûyî de li warê muzîk û strana Kurdî de heya çi qasî pêş ketiye?

Kazo: Erê di warê çandî de pêşkevtinên baş bi xwe ve girtiye, lê mixabin hindek leystikên neyara dîsan li ser me herdem ku çê dibin, vê gavê jî çê dibin, hem di warê muzîkê de jî wisan e, belkî muzîka derdora xwe em gelek jê hez dikin, bi taybetî eger em bingeha xwe negirin, emê gelek tûşî xeteran bin û emê ziman û peyvên xwe yên Kurdî jî winda bikin. Li gorî 3 sal berî niha ez dikarim bi bêjim Kurdistan 30 salan pêşve çûye.

Hem di warê stiran û muzîkê û hem jî di warê teknolojî û zanistê ve zaf pêş ketiye. Tiştekî xirab ku ez li vir dibînim di nava muzîkê de ciwanên me yên ku taze pêdigehin, ji kerema xwe bila tama Kurdî di helbestên xwe de berçav bigirin.

"Ez pêşeroja muzîk û strana Kurdî li Bakûrê Kurdistanê baş dibînim"

Mamosta Kazim, em hez dikin bizanin rewşa gelê me li Kurdistana Bakûr bi xasmanî di warê çand û muzîka Kurdî de çawa ye? Gelo gelê me heya çi qasî di vî warî de serbest e?

Kazo: Pirseke gelek bicî bû. Belkî di Kurdistana Başûr hindekî şansê wan heye ku vê gavê serbest in û heya vê demê ku di nava Ereban de jî bûn, li Radyo û Televîzyonan de dikarîn çand û zimanê xwe biparêzin. Mixabin li Bakûr tiştên wisan tune bûn. Di hemû hêlan de dengê gelê Kurd hatibû birîn, heta xwe nas nedikirin, rewşa îro ku em derdikevin li ser vê bingehê pêş ketiye, raste îro dema em mêzeyî çand û muzîka Kurdan li bakûr dikin, li dema bizav û serhildanên Kurdan heya îro di hemû qadan de pêşve çûye, hunermendên me yên Bakûr baş hev girtine. Ez di pêşerojê de jî baş dibînim û baweriya min ew e ku serkêşiya muzîka dunyayê jî Kurdan kiriye.

Tu derheq tevlîhav bûna muzîk û sitiranên Kurdî û Turkî li Bakûra Kurdistanê çi dibêjî?

Kazo: Raste, wexta mirov bû cîranê hev, bixwaze ya nexwaze hin tiştan ji hev werdigire û dide hev jî. Hin caran di warê muzîkê de jî dan û standin û guhertin çê dibin, lê tevlîhevbûna ku tu tînî ziman, di herîma coxrafiya Kurdistanê de tiştekî taybet bi xwe heye, Kurdan hunera xwe pêşkêşî tev aliyên cîhanê kiriye, em dikarin vê çendê bi zanistî jî bidne xuya kirin. Cara yekem di dibistana zanîngehê li qazaya Orfayê hatiye damezirandin. Me Kurdan îlam bi zanistî daye dunyayê, lê neyaran li ser me giran kirin, îro miletê Kurd li çar parçeyan de hatiye parve kirin. Asimîle bi ser wan de hate kirin, neyaran dengê wan bi zimanê xwe re guhartin. Lê dîsan jî serbarê hemû wan dijwariyane gelê me çanda xwe winda nekiriye û hertim neyaran muzîk û zimanê me ji xwe re dizîne.

"Muzîka me hêj gelek li cîhanê dûr û paş e"

li gor dîtina te stiran û muzîka Kurdî bi giştî heya çi qaseke pêş ketiye?

Kazo: Bi giştî di her çar parçan de dema mirov mêzeyî herêma Kurdistanê dike, hêşta em nikarin bibêjin ku em gihîştine qada navneteweyî an jî di qadekî hîn nêzîkî wê de jî ne, ji ber ku wî carê hewce em di nava cîhanê de ne diyar in. Diviya hêzekî mezin û li ser warê muzîkê bi xebatekî herî giştî û neteweyî bihê avakirin, ev car em xwe di nava cîhanê de bidene pejirandin. Mixabin me hêşta xwe nedaye qebûl kirin, muzîka me jî hêj gelek li cîhanê dur e, eva rastiyeke û diviya em vê rastiyê jî bibînin. Eva jî nahê vê manê ku em negehenê, ji ber ku emê bigehenê û jê derbas jî bibin.

Mamosta tu di stiranên xwe de zaf basa şoreşên Kurdan, rêber û gernasên Kurda dikî, merema te ji gotina wan serpêhatiyan çi ye?

Kazo: Eva cara yekemîn e ku ev pirse ji min tê kirin, em ji te pîroz dikin. Armanca min di naveroka stiranê ewa ye ku ev xweşiya ku em îro dibînin, em yê pêşiya xwe bîr bikin, ji ber vê çendê ku zarokên me bizanin ku gelê Kurd li çi rêyekê de hatiye, neyaran çi kiriye, rêberan çiqas canê xwe ji dest dane, kê di vê rêyê de xebat kiriye, û herwiha rêber û rênasên gelê Kurd em ji bîr nekin, da em ji nifşa pêşerojê re bidne xuya kirin ku bizanibin em bi çi zehmet û zoriyekê hatine. Ji ber ku ez behsa rêber û cengewarên Kurdan dikim da ku em xwe di rêya wan de bibînin û keda wan winda nekin, wan bidin nas kirin heya ku di dîrokê de nehên winda kirin.

Kazo heya çi qasî kariye xwedî bandor be li ser bizava rizgarîxwaz a gelê Kurd?

Kazo: Gelek ciwan e, gelek rast û xweşik bû te anî ziman, wexta ku mirov temaşa dike bandora Kazo çiqas kete li ser rojeva hunera gelê Kurd û armanca wî gihîşte kîjan astê, her hunermendek daxwaza wî ev e ku bi gelê xwe re bihê naskirin. Ez bi nînikê xwe bi kuratî der ketim, min tu hêz û piştgirî ji tu kesî negirtiye, tenê min xwe û malbata xwe li ser îmkan û derfetên xwe, serê xwe danî rêya huner û zimanê gelê Kurd de, min ji bo tu partiyekê xebat nekiriye, wê bandorê ez nikarim bibêjim, gel dê bibêje. Ez bawer im Kazo eger di rêza du yan çaran de nebe, di rêza dehan de ye. Di hemû herêmên Kurdistan û Ewropayê de Kazo îro bi kilasîka dengê kevnare xwe, bi gotinên şoreşvanî, bi helbest û stiranên xwe keriye bandoreke baş li ser ciwanan hebe û eva jî şanaziyekî herî mezin ji bo min e.

Gelo te çi hestek heye di nava şoreşvanên PDK Îranê û tu ji bo gelê me yê Rojhilata Kurdistanê çi dibêjî?

"Pêşmerge hêvî, bîr û baweriya hemû Kurdên Cîhanê ye"

Kazo: Daxwaziya min ev bû ez jî weke hunermendekî, her çend rola min ya hunermendî bû, lê di dilê min de Pêşmergayetî jî hebû, daxwaziya min dîtina Pêşmergan bû, dîtina şervanên azadîxwaz yên ku canê xwe didin û ber xwe didin û xwîna xwe dirêjînin ji bo azadiya gelê Kurd, helbete di vê şoreşê de me gelek bihayên giranqedir ji dest dane, lê bi xwîna wan şehîdên ku me ji dest dane, îro qada Pêşmergan di cîhanê de hatiye naskirin, bi taybetî ev ji me re gelek girîng e. Îro dewletên dagîrker gelek giraniya xwe dane ser hêzên Pêşmergan, bi taybetî Pêşmergeyên Qazî, Qasimlo û Şerefkendî di navbera du heb çiyayên teng de neyaran bi dorê girtine, lê wan serê xwe nedanîne û xebat û partiya xwe berdewam dikin, îro di Ewropa, Asiya û Rûsiyayê de ez di hemû qadên cîhanê de digerim, ez dengê PDK Îranê dibihîzim û daxwaziya min yek jî ev bû ku ez di nava wan de cih bigirim, îro jî ev daxwaziya min hatiye cî û ez bawerim ev yek di jiyana min de yê cihekî xasmanî bi xwe re bigre. Ew Pêşmergeyên me yên ku li serê çiyayên bilind ji bo azadiya gelê Kurd jiyana xwe ji dest didin, em nabne toza Sola Şeqala wan. Hêvî û bîr û baweriya Kurdên cîhanê jî hûn in. Lewra ez gelek keyfxweşim di nava we de me û daxwazê ji gelê me yê Rojhilat dikim ku bi hemû hêz û qaweta xwe piştgiriyê ji partiya rastî a xwe PDK Îranê bikin.

Çalakiyên we yên pêşerojê çi ne?

Kazo: Belê, min heya niha 25 kaset derxistine, kaseta min ya herî dawî jî 3 sal berî niha derketiye. Di pêşerojeke nêzîk de jî ezê kaseta xwe ya nû bi Koma Şêrwan re bixim ber çavê evîndarên dengê Kazo.

Mamosta Kazim gelek sipas ku te dema xwe bi me re veqetand?

Kazo: Zor sipas ez jî bi navê Rojnameya Agirî, tu dizanî Agirî çiyayekî welkane, li ser vê jî stiranên min yên taybetî hene. Ev jî remz û nîşana gelê Kurd e, ez jî rêz û hurmetên hunermend Kazo ji bo xwendevanên Rojnama Agirî re dişînim û gelek keyfxweş bûm û hertim ji bo wê serkevtinê, ji bo Kurdistanê azadî û ji bo Pêşmergeyan jî moralekî xweş û dilê şadî dixwazim.

Di Xewn De

Mihemed mehmûd beşar

Di xewn de didît ku welatê wî yê wî ye , ne yê kesên din e.

Di bin siya daran de dildaran dilberên xwe himbêz dikirin. Çivîkên ku di nav pelên nermok yên darên welatê wî ciheke hêmin hilbijartibûn, bi dengekî suruştî awazên buhuştê ji evîna wan re dixwendin.

Mamostayên fêrgehan dilên xwe kiribûn fêrgeh, û zarokên gund, pêşeroja gel, tîrêjên ronahiyê û canê nemiran di wir de aşnayî hev dikirin.

Pîremêrd û pîrejinên welatê wî li gencîtîya xwe poşman nedibûn, ji ber ku pêşeroja gencên welat bi gencîtîya xwe xemilandibûn.

Gencan nedixwestin bêpar bimînin ji têkoşîn û xebata di ber jiyanê de, ji ber vê yekê her du firiştên ser milên xwe -yê çep û yê rast- her du jî dikuştin û dibûn xwedanên xwe.

Beşek ji zarokên şîrmij piştî ku mezin bibûn, berên xwe dabûn zanîngehên welêt, bi hêvî bûn ku bibin xwendevan di beşê huner de.

Xwestek û awatên wan ew bû ku bikaribin bi çend parçe kevirên çiyayên welat û bi evîn û jiyana ku di rêya şîrê dayikan re keftibû nav xwîna wan de, peykerekê ji pêsîrên dayikên xwe re çê bikin.

Hetaw heya ku ji wê dihat disincirî, lê dilên wan zarokan hênik diman.
Demê jî xwe digivaşt, lê ken her dima li ser wan lêvên terikî.

Di welatê wî de çek qedexebûn, çekdar jî her nebûn, ji ber ku di dema hevwelatiyên wî dîroka welatê xwe dinivîsandin, di her rûpelekê ji rûpelên wê dîrokê de navê çekekê hebû, û li teniştwî navî hezar û neh sed û heştê û heşt û pênc hezar û yek pakrewan hebûn.
Ji ber ku her çekekê çil û şeş gencên welat binax kiribûn..
Çek bi yekcarî qedexe bûn.

Di welatê wî de gelek buhuşt hebûn - bi rastî tiştekî gelek balkêş bû - kesekî nedipirsî ev buhuşt yên kê ne, ji ber ku her kesî zanîbû ku qehremanên welat buhuşt ji asmanan daxistibûn xwarê.
Cemên hingev, şîr, mey, mast û yên ava zelal di nav xaka welatê wî de diherikîn.
Malxwê bibûn firişte û keybanî bibûn xwedê, xwedanên



buhuştên xwe.

Ji ber ku pêdivîya hevwelatiyan bi dojehê nebû, bang Umer Xanê Celalî kirin. Umer Xan jî dojeh xiste nav lepên xwe û agirê wê vemirand.

Paşê hevwelatîyan ji Umer re gotin: (pêwîst nake tu cermê gayekî bihêne ji bo tu cihê kela Dimdimê bi wî bipîve. Welatê me kevirên Dimdimê ji xwe re kirine

bingeh, tu dikarî navê welat bike Dimdimistan heger tu bixwazî).
Pêdiviya hevwelatiyên wî bi peymanên mafên mirovan tunebû, ji ber ku her mirovekî mafên xwe dizanî û her weha mafên hevalan diparast.

Di welatê wî de partiyên siyasî tunebûn, ji ber ku serokên partiyan xwe kiribûn bi qurbana welat.
Di goristana nemiran de jî cihên xwe girtibûn û gorên wan bi zêr û peran hatibûn xemilandin.

Her kesî bi bêdengî kar û barên jiyana xwe birêve dibir, bikaranîna deng ne pêwîst bû.

Lê bi tenê dengek ji dûr ve dihat, dengekî fedyok, şermok, lerzok.. her diçû bi hêz dibû, xurt dibû û nêzîk dihat, nêzîk.. nêzîk.. nêzîk dibû.
Nêzîk bû, kete guhê wî de, qîriya.. hey hawar.
Wey mala te.. bi wê qîrînê welatê ku bi pelên gulan, bi evînê, bi awazan hatibû avakirin, helweşand..û.

Veciniqî û ji nişka ve ji xew pengizî..!
Qîrîna xwe jî her berdweam kir..?

Çavên wî ketin çavên dayika wî de, dengê wî ji xwe fedî kir.. lerziya.
Sist dibû.. sist dibû.. sist bû, lê berî ku bikeve, dayika wî ew himbêz kir…

Piştî hezar û neh sed û nod û şeş salan carek e din vegeriya zarokekî şîrmij..!?

EMIR QEDIYA

Tenêbûn halê xuda ye
çima naçî tu dîwana cimetê
Bêkesî derdê sala ye
Daxil bibe kûraniya sihbetê

Piştevan be ji dozê re
Li bejnê ke tu kirasê rûmetê
Her dem rast be ji yarê re
Bibe guhdarê qise û şîretê

Evîn qedya koçebar bû
Me ji destan pir kişandî zehmetê
Yar xeyidî ji me dûr çû
Ne bû nesîb ku em bikin dawetê

Êdî kal in dipên roja
Şiyar nebûn em ji xewna xefletê

Ne man em dûr ji qewl û bela
Me venexwar ji şerab û şerbetê
Emrê dinê zû derbaz bû
Me jê ne dît serfiraza lezetê
Heta do sergerdan bûn
Îro ketin du fêkiyê cenetê.

Ji olên mirovatiyê Ola Zerdeşt



Ola **Zerdeşt** li ser elementarên sirûştê yên bingehîn hatiye avakirin. **Zerdeşt**ê ku weke pêxember tê dîtin û hejmartin, gotiye, ku Xwedê ji wî xwastiye, wan elementan biparêze. Ewana jî: **Av, Ax, Ba û Agir** in.

Paristina van di dema me ya niha de bûye histobariyek navneteweyî ya dewlet û saziyên paristina jîn û sirûştê li her derekê, giringiya ola Zerdeştî ya wisan dema zû diyar dike. Ew giringî bêtir ji ber vê yekê ye.

Zerdeşt, weke jêderên kevnar dibêjin, berî ji dayîkbûna hezretê **Îsa** –*silav û selewat lê bin*- jiyaye. Dîrokzanên Îranî dibêjin, ku ew sala 640'an berî zayînê li herêma **Urmiyê** ji dayîk bûye. **Urmiye** li bakurê rojavayê Îranê ye û dikeve serhedên **Rojhilata Kurdistanê** bi **Azerbaycanê** re. Hinek jî dibêjin, ku ew ji xelkê **Ray** ye li nêzîka **Tehran**ê. Em dizanin ku bajarê **Hemedan**a (*Akbatan*)a, ku nêzîk **Tehran**ê ye, di dema **Mîdiyan** de paytextê şahên dewleta **Mîdî** bû. **Mîdî** li ba dîroknas û gelnasan pêşserên gelê Kurd in.

Zerdeşt 30 salî bû, dema welatê xwe hêla û bi rojhilat ve mişext bû. Di rojhilatê Îranê de dest bi belavkirina ola xwe kir.

Di ola **Zerdeşt** de li ser pêdakirina gerdûnê, pêdakirina mirov û cîhanê, rêbazên dan û standinê di navbera mirovan da, bi sirûştê re û bi xwe re. Li ser jîna paş mirinê jî hatiye nivisandin û belavkirin.

Paş mirina **Zerdeşt** hikariya olên asîmanî û olên dî jî li ola **Zerdeştî** bûye. Lê dîsa jî di dema **Amêndiyanî** da ew bûye ola fermî ya wê deselatdariyê. Di dema împeratoriya **Arsakî** da, şah **Balaş**ê duwemîn ferman daye bo civandina hinek parçeyên pirtûka **Zerdeştî** yak u bi nave **Avêsta** navdar e. Lê ta çi pileyê di nav wê da ji olên **Mêtrayî** û **Zûrvanî** heye, em pê nizanin.

Di saya **Sasaniyan** da, **Zerdeştî** bêtir geş bû, lê hema di ber wê olê re **Zûrvanî** jî bi hêz bû. Carina ew baştir dihat dîtin û carina **Zerdeştî**. Em dibînin, ku di saya **Şapor**ê duwemîn û **Xisro**yê yekemîn da **Zerdeştî** li pêş bû, hema di saya **Yezdîgurd**ê yekemîn û **Yezdîgurd**ê duwemîn da **Zûrvanî** ketibû ketibû pêşiya **Zerdeştiyê**. Bi têkçûna deselatdariya **Sasaniyan** re, êdî rewşa **Zerdeştiyê** jî bi bin ve çûye.

Di ola **Zerdeştî** de, weke di ya **Zurvanî** da jî, dîroka gerdonê hatiye birîn. Her demgavek "**Awûnek**" 9000 – 12000 sal e. Dema dawiya awûnekê nêzîk bû, cîhangeş (***Zawûsyar***) pêda dibin. Ewan bi "**Kurên Zerdeşt**" tên navkirin. Histobariya wan ewe, ku cîhana pîr û nexweş ser ji nû ve pak û ciwan bikin, wê vejînin û geş bikin. Ewana kerî û colê bawermendan di têkoşîna li hember zorbaziyê, nebaşiyê û wêrankariyê da dajon, hêza bawermendan dicivînin ser hev û dilên wan bi nasîn û îzanênê **Zerdeştî** paqij û geş dikin, jînê dişûn. Mirin û pîrê mirinê ji ber wan direvin, cîhan tev dibe madenê kelandî, dih'ele û di nav xwe da nebaşî, qerêjî û pîsît û baweriya çewt dipişive, jînek nû û cîhanek nû tê pêdakirin. Sipî, pak û herheyî dibe.

Tevî ku parvekirina demê, wek tê guman kirin, ji **Zûrvaniyê** hatiye, em dikarin bibêjin, ku ola **Zerdeştî** bi wê parvekirinê hiker bûye.

Demgava cîhanî 12000 sal in, her 1000 sal wek

mehek me ne. Di Demgava cîhanî da 12 sal hene. Her sê hezar sal ji wan salbirrek e.

Di 2999 salên pêşîn da, hemî afirende ji aliyê Xwedayê Mezin (***Ahûra Mezda***) ve tên pêdakirin. Lê ewan di berzexekê da wilo dimînin, nalivin, nayin guhartin û di rewşa xwe ya canekî "*rûh'î*" da dimînin, ne ji wan kêm dibe û ne tiştek dikeve ser wan.

Di 3000-5999 salên dî da, wan pêdakiriyên canekî rewştên xwe diguhêrin û dibin meteryal. Ta wê pileyê zevîn "*Erd*" hîn paqij û bêgunah e. Li ser rûyê zevînê **Gayûmerd** "*Gamêr*" û **Ûrînd** di teherek behiştî da dijîn.

Ahrîmanê nebaş û şeryar ji binzevînê "*jêrzemînê*" derdikeve û pêdakariyên Xwedayê mezin (***Ahûra Mezda***) dibîne û dixeyide. Ew xwe digihîne serhedên "*tixûbên*" cîhana ronahiyê, lê nikane derbas be û çavkûrkî dimîne. Ew dixwaze dijî pêdakirinên **Ahûra Mezda** tiştekî nebaş bike, lê nikane. **Ahûra Mezda** bi ser wan afirendiyên xwe da **Axûn Fîrya** dixwêne û ji ber telasima wê xwendinê **Ahrîman**ê şeryar teviya wê demê bê hikarî û bê hêz dimîne, tiştek ji dest wî dernakeve.

Paş 6000 salan **Ahrîman** dikare ji tengiyê derkeve û bi teviya hêrs û xeyd û nebaşiya xwe ve derbas dibe cîhana ronhaiyê. Ew cîhana paqij û mezin û wek hêkek sipî vedibirîse. **Ahrîman** ji binî ve wê hêkê quldike û leşkerê wî yê wek mêşan, bi ser afirendeyan da belav dibe. Ewan jehr û nebaşî û mirinê bi xwe re tînin. Mirov ên kevnekok û sewal ên kevnekok dibin qurban û têkdiçin, lê belê ji tova **Gayûmerd** cotek mirovê nû, **Mayax** û **Mazyanax** (***Adem û Hewa***) û ji tova gayê kevnekok jî sewalên nû pêda dibin. Li ser rûyê zevînê mirovê, ku dimire û nebaşî tev li xwîna wî bûye, dest bi jîna xwe dike.

Di 9000-12000 salan da, ku li dawiya vê saldemê temenê demê diqede, başî û nebaşî, ku tev li hev bûne, ji hev verêdibin. Di vê saldemê da, li pey hev, di her **Mênok**ekê "***Mîlîniyûmek***ê" [**1000 sal**] da **Zewsiyan**ek "*Pêxemberek*" derdikeve, cîhanê carekê ji qerêjiya **Ahrîman** pak dike. Bi hatina yê dawî re, kesên mirî wê rabin û wê cîhan bi lehiyek madenî ya li kel ketiye bite helandin û paqijkirin.

Li gor dûroknas **Albîronî**, **Hormezd** (**Ahûra Mezda**) afirendê asîmanî yê tewr kevnekok e û **Zerdeşt** ê ku di seriyê navdema duwemîn da heye, pêxember û şandiyê wî ye, lê ew di rewştek veşartî da dimîne û di destpêka navdema sêyemîn da, gava **Ahrîman** tev li karê cîhana paqij dibe û nebaşî û şeryariyê belav dike, **Zerdeşt** ji aliyê **Hormezd** vet ê şandin, nasyariyên wî belav dike û başiyê li hember nebaşiyê dirist dike, paqij û xort dike.

Di navdema sêyemîn da, sê peyrewên **Zerdeşt**, li pey hev derdikevin, **Uksiyat Arta, Uksiyat mênah, û Astvat Arta**, ku wek kurên **Zerdeşt** tên dîtin û tova pişta wî ya, ku di zireya "*behra*" **Kasavoya** da parastî ye, pêda dibin.

Li gor vê nêrînê, **Zerdeşt** berî **Platon**ê yûnanî bi 6000 sal hatiye dine, wilo **Platon** wek **Şagirt**ê **Zerdeşt** tê dîtin. Ew ji her aliyekî ve pak e û pir hişmend û zana ye, û şandiyê berî dawîbûna teviya dema cîhanê ye.

Li gor pirtûka heftemîn a **Dênkart**, **Spandnask** a windayî, **Zerdeşt** di seriyê navdema çaremîna temenê dema cîhanî da tê dinê. Kurê **Zerdeşt** ê dawî **Astvat Arta**, ku **Zewsiyan** û rizgarkarê dawîne, kesekî şervane û serkeftî ye, û ew cenga paqijkirina cîhanê ji leşkerê **Ahrîman** û ji qerêjî û nebaşiya wî dike û cîhanê bo rewştek behiştî û stasiyona dawîn amade dike. Hinde musilman dibêjin, ku **Astvat Arta** pêxember **Mihemmed** – *Silav û Selewt lê bin* – bi xwe ye, ew bi leşkerê tariyê re dikeve şer û bi serdikeve, hema **Mûsa** yê ciho – *Silav û selewat lê bin* – ji ber **Fîrûnê Misrê** û leşkerê wî ber bi **Filistîn**ê ve direve û di çi şeran da bi sernakeve. Ola **Islam**ê jî wek ya **Zerdeştî** cîhanê di navbera ronahî û tariyê da pardike, her li ser rizgarkirina mirovan ji tariyê û gihandina wan nav ronahiyê dibêje.

** Bo bêtir agahî û nasîn li ser ola Zerdeşt, ji comerdiya xwe vegere nivîsên **Dr. Gulmorad Moradî**, ku lêkolînên wî yên bi Almanî belavkirîne ji me re bûne bingeha serekîn div ê gotarê da.*